# PIRSGIRÊKA SÎAWÛŞ, ZEMBÎLFIROŞ Û YÛSIF

## Şemoyê Memê

### Kurte

Sîawûş, Zembîlfiroş û Yûsif sê zilamên ne rêzê ne ku neheqîya sê jinên bimêr, dilberdana wan ya nerewa û xweparastina wan ya ber destdirêjiya wan jinan heta roja îro bûne mijara gelek cureyên wêjeyê û hunerê. Çîrokên wan sê zilaman û her sê jinan nemaze di nav wêjeya Rojhilat de gelek berbelav e û bi navên Sîawûş û Sûdabe, Zembîlfiroş û Gulxatûn û Yûsif û Zuleyxayê navdar in. Tiştê ku bala meriv dikişîne û çîroka wan ji rêzê derdixe ew e ku yên sewdaser dibin û pey dilketiyên xwe har û dîn dibin ne mêr in, jin in û jinên bimêr in. Ev mijar çawa bûye behsa wêjeya Rojhilatî helbet di nav wêje û zargotina kurdan de jî cihê xwe girtiye û gelek şêweyan hatiye honandin. Em ê di vê xebatê de hewl bidin behsa van her sê kesan bikin û hevbeşîya wan raxin ber çavan. Ji bo ronîkirina mijarê helbet em ê pala xwe bidin nimûneyn zargotina kurdî.

### Destpêk

Di mîtolojî û efsaneyan de dinyayeke sembolîk û îdeal tê şayesandin. Ev dîyarde di çîrok û destanan de jî derdikeve pêş me. Gelek bûyerên rojane dibin mijara van çîrokan, ev bûyer wekî pergaleke fêrbûna dinya, mirov û hebûnê dihatin bikaranîn. Gelek diyardeyên civakî, kesayetî û derûnî bûne mijara van çîrokan wekî sewdaserî, qencî-xirabî, dirûstî(şîrhelalî)-mixenetî, nefspiçûkî-quretî û hwd. Ev diyarde bi kesayetan hatine temsîlkirin. Diyardeya sewdaserî, pakî-qencî, şîrhelalî, nefspiçûkî babeta vê lekolînê ye û bi şexsê sê kesan de em ê binêrin ka ev mijar çawa hatiye honandin.

Sewdaserî seranserê dinyayê mijara gelek çîrokan xemilandiye, em dikarin bêjin ku ev mijar herî zêde di nav çanda rojhilata navîn de derketiye pêş. Hema bêje di hemû çîrokan de yê sewdaser dibe û pey dilketiya xwe dikeve helbet mêr e; carcaran Qeys (Mecnûn) carcaran Ferhat, carcaran Mem û hwd. Ev kesên sewdaser dibin her du jî ezep in. Ew kesan kêmcaran digihîjin mirazê xwe. Lehengên mêr pey dilketiyên xwe, wek Qeys har û dîn dibin û çola dikevin, wek Mem dikevin pey cih û warên xewna şevan û dikevin rê û dirbên çûn û nehatê. Carcaran jî wek Ferhat şert û mercên gelek giran wan tê barkirin ku ne karê mirovan e. Ev motifeke gerdûnîye. Berevajî vê yekê li ser mêran dîn û harbûna jinan herçiqasî diyardeyekî asayî be jî, ji ber şert û mercên civakû û bendewariyên civakî û exlaqî, ne motîfeke ewqasî berbelav e. Ev motîf di nav wêje û zargotina Rojhilata Navîn de, helbet di nav zargotina Kurdan de, herî zêde û baş di şexsê Zulêyxa, Sûdabe û Gulxatûnê de hatiye derbirîn. Derbirîneke civakî, exlaqî û derûnî ye û em dikarin bibêjin ku li ser rikberiya rûhanî û nefsaniyê hatiye avakirin.

Sewdaserbûna sê jinên bimêr û xwesteka dilê wan ku sê mêrên çeleng û bedew, bûye mijara wêje, zargotin û çîrokên mîtolojîk, olî, zargotinî û wêjeyî. Berevajî motifa sewdaseriya ji rêzê ango ya mêran li ser jinan, ev mijareke kûr û girêkî ye. Dîsa berevajî sewdaseriya yekemîn, di ya duyemîn de sewdaserî ne li gorî dualiyan e, sewdaser yek alîye û li gor pîvanên van her sê zilaman an jî li gor pîvanên exlaqî, civakî û olî tiştekî nerewa ye loma lehengên mêr heta dest wan hatiye dij vê tekiliyê rawestiyane. Tiştek balkêş jî ev e ku jin neçûne li ber piyên mêran, mêr hatine ketine tora wan. Sîawûş piştî gelek salên dûrî mala bavê xwe, tê dikeve tora Sûdabeyê, Yûsif ji Kenanê derdikeve di xortaniya xwe de dibe bendeyê Zuleyxayê û di mala wî de dikeve tora wê, dîsa Zembîlfiroş jî di mala Mîr û Gulxatûnê de dikeve tor û dafika Gulxatûnê. Jin xwedîhêz in, cihê wan koşk û seray in, desthilat in loma karîbûne bi asanî dest bavêjine bendeyên xwe û bêyî ku kesî şerm bikin û bitirsin. Helbet ji ber bedewî û çelengiya van her sê zilaman, agirê dilê wan serê wan gêj kiriye û ji bo gihîştina miraz û meremên xwe çi ji dest wan hatiye texsîr nekirine. Bo nimûne "Piştî ku Zuleyxa, Yûsif li bazarê dîtî û ew bi mêrê xwe daye kirîn, ev çalaktiya wê zêdetir diherikit heyecana seyra çîrokê bilindtir diket. Lewra ew bi çavên korê di riya Yûsifî de her tiştî diket…Wexta ku Yûsif hatiye seraya 'Ezîzî, Zuleyxa ji deverên dûrhostayên şaraza didete înandin û dest bi çêkirina koşkekê diket. Di çirokê de ev wek

“xaniyê heftê/xaneyê heftum” derbas dibit ku Zuleyxa di wê de heft odeyên li pişt heft deriyan didete çêkirin. Ji Çînê neqqaş û ressaman didête înandin û li ser dîwarên wan odeyan teswîr û weneyên eşq û evînya xwe û Yûsifî didete neqşkirin( Geverî, 2013; 83)

Em dikarin bibêjin ku van her sê jinan ya herî curetkar û wêrek hema bêje Gulxatûn e. Merem û nêta dilê xwe Zembîlfiroş re bê perde û rûpoş, bi asanî eşkere dike û dibêje ku;

“tu hem şayî, hem şevbihêr,
ev e ji te ra bazar û xêr”   û di pêş de diçe;

“Lawikê nezan tu çima şermîn î?
Silav bike memikên zêrînî
Tu ê xêrê ji wan bibînî
Te ez bi dil can va birim
Te nebînin ez dimirim  …”

“Tu kêf bike kêfa mezin
Bira gunê te ji min bixwazin
Lawiko were ser şekir û sêvan
Wan bimije bi dev û lêvan
Sîng û berê min ji te ra meydan,
Li ser sîwar be bajo heyran.”( Destnivîsa Qanatê Kurdo, Vdg. Samûr;2015; 222)

Sîawûş, Zembîlfiroş û Yûsif sê lehengên  qenc, şîrhelal û xwedîîffet in ku dest neavîtine xirabiyê û ji ber vê yekê jî cirm li wan hatiye kirin. Qedera van her sê kesan jî  hema bêje wekî hev e. Sîawûş destê dêmariya xwe, Zembîlfiroş destê  jinmîrê û Yûsif jî destê jina  melîk û xwedîyê xwe (ew jî tê hesibîn wekî dêmarî[1])  dikeve tengasiyê û  cezakirinê  ji rêderketinê çêtir dibînin û nakevin nava fêl û lîstikên wan jinan. Ev her sê kes sembola pakî, qencî, nefpakî û îffetê ne. Sîawûş ji ber ku destê Rostemê Zal hatiye mezinkirin û perwerde kirin, çîroka wî derbasî zargotina kurdan jî bûye û di nav şaxên destanên Rostem de cihê wî yê taybet û birûmet jî heye. Bêgunehiya wî û kuştina wî ya neheqî bi xwe re her sal ji bo wî merasîma şîngirtinê jî anîye. Her wisa pakî û dirûstiya Zembîlfiroş û Yûsif jî û bobelatên hatine serê wan ev her sê kesan di nav efsaneyan de, di nav bûyerên dilsar û xemgîn de bicî dike. Zembîlfiroş jixwe destaneke xwerû kurdî ye û vê motifê pir baş dihonîne. Em dikarin bibêjin ku di vî hêlê de mînaka herî balkêş e. Çîroka Yûsif herçiqasî çîrokeke Îbranî û dînî be jî çawa di  nav zargotin û edebiyata miletên Rojhilatî de hatiye honandin helbet ev çîrok bûye mijara edebiyat û zargotina kurdî jî.  Di nav van her sê kesan de yê  herî xweşbext helbet Yûsif e ku axiriya wî ne mirin e. Sîawûş cih û warê xwe diterikîne û axir dikeve ber xezeba Efrasiyab û serê wî tê jêkirin. Derheqê Zembîlfiroş de agahiyên dîrokî nîn in. Lê li gor çend guhertoyên zargotinî Mîr mixenetiya jina xwe dihese û  her çiqasî Zembîlfiroş bêguneh be jî mirin dibe para wî jî.

Xwedî nefsekî pakî bûn, dilpakî û xwedîîffetbûnê mijareke berbelav e. Îffet û nefspiçûkî herî zêde jina hatiye xwestin ku jin sembola namûsê hatine hesibîn. Berevajî vê yekê nehatiye payîn ku mêr  ew qasî girêdayî vê xeysetê bibin. Loma  mijara nefspakiya mêran pir kêm hatiye honandin û çîrokên mêrên nefspak û xwedîîffetê bûne babeta heyirînê. Wekî di hemû çîrokên qedîm  û yên nûjen de mêr pey jinan dikevin û dibin dildar, ne jin. Mêr dixwazin jin jî yên tên xwestinê ne. Lê di van her sê çîrokan de yên tên xwestin mêr in. Ew jinên ku pey van mêran ketine û derî edet û toreyan tevgeriyane û şer û buxtan avîtine mêran, li gor bendewariyên civakê divê bihatana cezakirin û em dibînin ku Sûdabe ji ber kirina xwe tê kuştin, Gulxatûn  çola dikeve û Zuleyxa jî çola dikeve û axir  parsekiyê dike. Li gor çend guhartoyên çiroka Yûsif,  bi marîfeta Cebraîl Zuleyxa dîsa vedigere emrê xwe yê ciwan û dibe keçeke xweşik û Yûsif wê mar dike. Li gor çend guhartoyan, dawiyê Gulxatûn jî digihije mirazê xwe û Zembîlfiroş wê jî wek hêwî mar dike. Di van şexsan de pir eşkere ye ku kesê herî bêbext Sîawûş e

[1] Taberî behs dike ku melîkê Misrê Atfîr,  Yûsif dikire û Yûsif sêzdeh salan di mala wî de dinîme û wî ne wek bendeyekî wekî lawekî xwe dihewînin. Dîsa Taberî behs dike ku navê jina Atfîr “Raîl” bûye. Ev jî tê hesabê dêmariya Yûsif.

ku di xortaniya xwe de ji ber destdirêjî û xezeba dêmariya xwe, bêrehmiya bavê xwe û bêbextiya xezûrê xwe Efrasîyab, dibe qurbanî.

**Xwîna ku di Gumgumê de Dikele: Sîawûş**

Sîawûs di dîrok û mîtolojiya Îrana qedîm de lehengekî giring e û ji binemala Keyanîyan kurê Key Kawûs e. Dîya wî jineke Tûrani ye ku xizmê pelewan Gersîvez e. Di Avestayê de navê wî Sîyaverşen e ku maneya wê, xwedî hepsên reş e. Di zimanê Pehlewî de navê wî wek Sîyavûsh an jî Sîyavehş tê bilêv kirin. Paşê jî ev nava wekî Sîyavûş hatiye bilêv kirin û di zargotina kurdan de wekî Syawûş hatiye zanîn. Kelayeke mezin û zexm, bi navê Sîyavûş-gird, an jî Sîavûş-kerd ava kiriye. Li gor efsaneyan ev kela ji destê Sîawûş li ser serê cinan hatiye avakirin û paşê kurê wî Key Xisro ev kela daxistiye erdê û bicî kiriye. Sîawûş merivekî xwedî hêz û xwedî qudreteke bilind bûye. Sîawûş nebûye padîşah û wekî mirazqurmiçî di navbera bavê xwe û Efresiyab de maye. Li gor zanyariyan B.Z. di sedsala 6an de jiyaye. Lê kurê wî Şahê Îranê yê herî navdar e. Kurê wî Key Xisro (Kûraşê II.) B.Z. di nav salên 559-529 an de bûye desthilat. Ango sî salî hukim kiriye. Ji ber ku neheqî lê hatiye kirin û mirineke xedar bûye para wî bûye kesayetiyeke mîtîk û efsaneyî. Em dikarin bibêjin ku qedera Sîawûş bi destê Sûdabeyê hatiye xêz kirin. Ger Sûdabe nîn bûya, navê Sîawûş jî nedikete nav çîrok û efsaneyan.

Kesên ku herî zêde derheqê Sîawûş de agahî dane Firdewsî û Taberî ne (P.Z. 839). Li gor Şahnameyê û tarîxa Taberî destana Sîawûş wisa ye; Bavê Sîawûş Key Kawûs şahekî nezan, serhişk, bêpergal û qure bûye. “ Rojekê, kurekî wî bû ku ji aliyê bedewî, bejn û bal, rû-rûçik û bêkêmasiyê de bêrikber bû. Bavê, navê Sîyavahş lêkir”( Taberî;729). Kurê xwe yê heft salî, Sîawûş dide ber destê pelewanê xwe yê navdar Rostem. Sîawûş berdestê Rostem mezin dibe û dibe pelewanekî mêrxas û zana. Rostem wî wekî kurê xwe dihewîne û bi vî şiklî perwerde dike. Dadokên herî baş wî dimijînin û dielimînin. Siwarekî çak jê derdikeve. Rostem wî dielimîne wêje û rabûn-rûniştinê û dibe stara Sîawûş ku piştî kuştina wî tola wî bi destê xwe ji Efrasiyab distîne.

Piştî çend salan Sîawûş vedigere mala bavê xwe. Sîawûş êdî ne zarok e, xortekî çeleng û lihevhatiye û şarezayê gelek tişta ye. Li gor gotinan, piştî mirina diya wî, Key Kawus qîza şahê Hemeweranê, li gor çend zanyariyan jî qîza Efresîyab, Sûdabeyê wek jin tîne. Li gor Taberî Sûdabe(Sûzabe) pîrekeke sêhrbaz bûye. Piştî vegera Sîawûş dilê dêmariya wî, Sûdabeyê dikeve Sîawûş. Ji ber ku Sîawûş merivekî pak û xwedî şermê ye, rû nade dêmariya xwe û wê dilomîne. Sûdabe nagihîje armanca xwe û gelekî diqehire loma şer davêje wî ku çav berdaye dêmariya xwe. Giliyê wî li bal şah dike û şah lê sor dike. Li gor edetan divê Sîawûş pakbûna xwe ispat bikira. Diviyabû, Sîawûş li ser hespê xwe, di nav agirekî gur re derbas bûya ku pakbûn û edebiya xwe ispat bikira û ev yek jî kiriye û êgir bi sax û silamet filitiye.[2] Lê belê Sûdabe dîsa jî dev jê bernedaye. Ji ber ku Sîawûş xwestiye, xwe, xwestek, rik û kîna Sûdabe dûr bixe, rizadilî diçe şerê li hember Efrasîyabê. Efrasîyab ji ber mêranî û mêrxasiya wî diheyire û dawa lihevhatinê jê dike. Sîawûş dawa lihevhatinê qebûl dike lê Key Kawûs vê yekê ne qayîl e, loma Sîawûş jê diqehire. “Ji ber ku ji alîyê Efrasîyab hemû şert û mercên wî pêkhatine, nabe ku belesebeb bavêje ser, ev yeka bêrêzi ye, loma neavîtiye ser Efrasîyab. Sîawûş dizanibû ku sebeba vê şerê Sûdabeye ku xwestibû wî rê derbixe û mixenetîyê şah re bike” (Taberi, 730). Piştî vê yekê Sîawûş diçe bal Efrasîyab binecî dibe. Efrasîyab qîza xwe Firingîsê û pelewanê wî Pîran jî qîza xwe Cerîreyê wekî jin didin wî. Bi destûra Efrasiyab li bajarê Hotenê bi navê Gengdij(Sîyaviş-gird) kelayekê ava dike û maîyeta xwe di kelayê de bicî dike û êdî rojên xwe li wir derbas dike. Efrasîyab birayê xwe yê bi navê Gersîvez jî dişîne ba Sîawûş ku derheqê hewldanên Sîawûş de agahîyan bide wî. Gersîvez çavreşî û hesûdiya Sîawûş dikir û dixwest ku Sîawûş ber çavê Efrasîyab reş bike û ev firsend jî ketibû destê wî. Der heqê Sîawûş de xeberên derew û nerewa dişîne. Xwedêgiravî Sîawûş Rostem xwestiye ku bê û erdê Tûraniyan dagir bike. Xezeba Efrasiyab li ser Sîawûş radibe û fermana serjêkirina Sîawûş tê dayîn.

---

[2] Agir wekî jihevderxistina guneh û rastiyê hatiye bikar anîn û ev tesira ayîna zerdeştiyan tîne bîra mirov. Ezmûna êgir di çîroka Hz. Îbrahîm de jî derbas dibe ku agir pakiyê û paqijîyê temsîl dike. Hemû nexwaşî û xirabiyan paqij dike an jî xiraban dişewitîne lê qencan paqij dike. Helbet ev motîf koka xwe zerdestiyê digire. Ev jî piştrast dike ku gelek baweri û edetên îslamê ve girêdidin ji zerdeştiyê tên.

Li gor Taberî Sîawûş bi exlaq û sernermiya xwe, aqil û jîrbûna xwe, çaksîwarî û zîrekiya xwe ve pêş ketibû. Ev yeka jî bû sedema  hesûdî û çavreşîya zilamên Efresyab. Loma du kurên wî û birayê wî Kider bîn Fîşencan hewldan ku Efresiyan li ser sor bikin.  Axir gihîştine armanca xwe jî û ew kesan Sîawûş dikujin (Taberi;732).

Xebera mirina Sîawûş wekî birûska kulê digihîje Îranê. Rostem, Sîawûş wek kurê xwe hewandibû, bi kuştina wî re gelekî diqehire û ji ber ku şer avîtibû ser Sîawûş û bûbû sebeba pevçûna bav û kur û bûbû sebeba mirina wî, berê ewil Sûdabeyê dikuje. Paşê erîşî ser Tûraniyan dike û welatê wan wêran dike. Piştî mirina  Sîawûş ji Firingisê kurekî wî tê dinyayê. Firingîs,  navê  Xisro lê dike. Efrasiyab wî radestî şivanan dike ku haya wî ji malbavanê wî nîn be. Pelewanekî Îranê Gîvê Guderz piştî lêgerina heft salan rastî Xisro tê û wî bi dizî direvîne dibe Îranê û zirx û gurzê Sîawûş lê dike, hepsê Sîawûş sîwar dike û êdî Xisro dibe Key Xisro û bi alîkariya Rostem tola bavê xwe, ji Efrasîyab distîne.

Di nav zargotina kurdan de jî gelek çîrokên Sîawûş hene lê hemû nehatine tomar kirin. Hecîyê Cindî di vî derbarê de xebata herî berfireh amade kirîye. Ev bûyera mîtîk û dîrokî dirûvê kurdî wergirtiye û wekî çîrokekî heremî hatiye vegotin. Di berhevoka Heciyê Cindî de çîroka Sîawûş wisa ye;

"Cihê Îranê padşa heye. Navê padşê wan Kinkaûs e. Kurekî wî heye, navê wî Syawûş e. Padşa êvarê go:
- Syawûş, delal bike gazî, ku herçî xwe nav zîn bigirî, siyar bî, sibê em biçine seyranê.
Sibê rabûn çone seyranê, çone nava rê. Padşa bezbendê xwe bîr kir,  gote kurê xwe:
- Syawûş here bezbendê min bîne. Roja bezbendê min ne li gel min be,  şuxulê min nexêrê  ye. Kurê wî zivirî hate mal. Dyake wî heye, dyak xort e, damarî, jinbab e. Ewê êdî dest avête  Syawûş, gotê :
- Tu bêyî ba min.
Syawûş gotê: Tu dya min î, şuxulê wa ez nakim.
Jinikê go: Seba te min babê te stend. Wekî seba te nebe, min babê te nedistend.
Syawûş çawan kir, jinikê bela xwe jê venekir. Ew jî rabû kulmek devê jinikê da, dev li xûn kir. Êdî enirî, rabû ço. Penîk li qutîê da, qutî şkênand. Bezbendê babê xwe jê deranî, êdî ço riya dî. Diha riya babê xwe neçû.
Padşa ma êdî heta nîvro, kurê wî nehat, go: "Îro tiştek li mala min qewimîye lema kurê min nehat." Edî go wezîrê xwe:
- Em vegerin, îro emê çine mal, roja me ne ya xêrê bû.
Êdî jina padşê rabû,  xanîê xwe diheşê da reşkir, porê xwe giş kir, ser dêrî rûnişt heta padşa hat.
Padşa hat, got: Herê jinê ev çi li te qewimîye, te çi li xwe kirîye?
Go: Here sewîê kure xwe bipirse.
Êdî padşa go: Kurê min çi kirîye?
Go: Kurê te dewa namûsa te kirîye.
Êdî padşa zef enirî, go: Kurê min çawa dest bavê jina min? Êdî rabû gazîkir Gêvo, Tûzê  Nevzer go: Rabin herin, li ku kurê min dibînin, kurê min bikujin. Cilê wî bi xûn kin, bo min bînin, ca behna min bête der." ( H. Cindî; 1978, 277  )  Lê belê  dilê pelewanên Key Kawûs qayîl nabe ku Sîawûş bikujin loma destek kincê teze werdigirin û kincên Sîawûş re diguherin û  xezalekê dikujin û kincê wî xwina xezalê didin û diçin radestî Key Kawûs dikin ku kurê wî kuştine. Sîawûş jî diçe Tûranê û li bal Efresyab dimîne. Lê belê pelewanê Efresyab,  Hinan çavreşiyê lê dike û dixwaze ber çavê padşa wî reş bike û bide kuştin. Axir digihîje armanca xwe û serê Sîawûş dide jêkirin. Sîawûş berê mirina xwe temî dabû jina xwe Firingîsê ku xwina wî ji bavê xwe bixwaze  bike gumgumekî. Firingîs xwina wî berhev dike, dike gumgumekî. Xwina Sîawûş gumgumê de keliya û keliya. Axirê Rostem kurê Sîawûş Key Xisro û dîya wî Firingîs dibine û serê xwînxarê Sîawûş jê dike û paşê xwina Sîawûş zelal dibe."

Di şaxeke  de jî  Sîawûş ne kurê Key Kawûs e, birayê wezîrê wî Gevê Goderz e. Ji ber ku zarokekî pir bedew û xas bû, ber dilê Key Kawûs pir delal bû loma wî wekî kurê xwe hildibijêre. Dêmariya wî jî gelekî jê hez dikir. Dida ber pêsîrê xwe lê wexta ku Sîawûş mezin bû û bû mêrekî delal û çeleng, dêmariya wî nêta xwe xirab kir, dilê xwe berda yê. Xwest ku Sîawûş xwestina dilê wê bike û hev şabin. Lê belê Sîawûş ev yeka nepejirand û got: " Go: Axir tu dya min î, tu jina padşê min î, namûsa me qebûl nake." Lê jina padşê dev ji Sîawûş bernedaye. Tê gotin ku rojekê padşa û maîyeta xwe diçin

neçîrê lê belê jina padşa bi meneya nexweşiyê, Sîawûş naşîne ku belkî xwesteka dilê xwe pê bide kirinê.

“Go: Bi ezet, celaletê Xwedê kim,
Tu vî şuxulî gel min nekî,
Ez ê serê te bidime birrîn.
Go: Min carekê gotîye, tu dya min î,
Ez ê vî şuxulî bi te ra nakim.
Jina padşê rabû çikir?
Derpê xwe qelaşt, çir-çir kir, avête li wê.
Kêfa xwe xirabkir, rûnişt li cihê xwe.
Êvarê padşa ji nêçîrê hat,
Gel jina xwe qisekir.
Jina wî xeber neda.
Padşê gotê: Qencê,
Çira bi min xeber nadî,
Çi qewimîye te?
Go: Te bîj (bîç) anî mala min.
Vê sibê hûn çûn nêçîrê,
Rabû destê xwe avête min.
Ez gel destê wî neçûm,
Derpê min hemû çir-çir kir, avêt.
Ez bênamûs kirim.
Yanê tu ê serê wî bavêjî,
Yan jî ez mala te da namînim.
Padşa bawer nekir, zane derew e.
Bêbextîyê jina wî dike.” ( Cindî, 1978; 300 )

Ev şaxên Sîawûş pir dişibin çîroka Misirî ya qedîm, Anûbîs û Bata yê. Di British Museumê de papîrûsek heye. Papîrûsa D’orbiney hatiye navkirin û bi destê nivîserê serayê, bi texmînan B.Z. di sala 1225an de hatiye nivîsin. Anûbîs û Bata du birane û û Anûbîs, Bata mezin kiriye. Anûbîs zewicî ye û jina wî dilê xwe berdaye tîyê xwe Batayê. Bata kar û barên birayê xwe birê dibe û cotkarekî zana û jêhatî ye û zilamekî nefspak û şîrhelal e. Rojekê wexta toxim reşandinê toximê wan xilas dibe û Anûbîs wî dişîne mal ku toxim bîne. Bata tê mal, jinbirayê xwe toxim dixwaze, jinbira ji ber ku serê xwe şedike dibêje bila bixwe here hilde. Bata sê çûval ce û du çûval genim xwe bar kiribû. Jina birayê wî heyra hêza wî dibe, kela wî dikele û dixwaze meremê dilê xwe bîne cî û evina xwe jê re eyan dike. Lê belê Bata vê yekê qebûl nake, wekî leoparekî har û dîn dibe û vê yekê tiştê herî xirabtir binav dike û dibêje ku “birayê min, min wekî zarokekî we xwedî û mezin kiriye, tu cara mixenetêyê pê re nakim, ev yeka guneheke mezin e” û paşê vedigere zeviyê. Jina Anûbîs ditirse ku Bata her tiştî merê wê re bibêje loma kiras û derpêyê xwe diçirîne û bi halekî pêrîşan benda Anûbîs dimîne. Wexta ku Anûbîs tê mal, wekî her roj jê re av nedaye ser, çirayên malê vênexistîye. Anûbîs dikeve şikê û wexta ku dikeve odê, jina xwe bi halekî pêrîşan û şerpeze dibîne û jinik jê re dibêje ku Bata destdirêjiya wê kiriye û xwestiye ku hev şabin û tede li wê kiriye. Jinik dixwaze ku Anûbîs, Bata bikuje. Ger wî nekuje ew ê bimire. Anûbîs radihêje rimekê û benda Bata dimîne û wexta ku Bata garanê tîne êxur, conegayek li pişt dêrî Anûbîs dibîne û Bata hişyar dike ku nekeve hundir û gava Bata rewşa birayê xwe dibîne, fehm dike ku jinbiraya wî îlave lê kiriye û ji destê Anûbîs direve. Ji xwedan Ra alîkariyê dixwaze. Ji nişka ve çemek di nav wan de peyda dibe û ji ber ku çem tijî tîmsah in Anûbîs nikare derbas bibe. Bata dilpakî û xweşhelaliya xwe jê re eyan dike û birayê xwe qanî dike. Bata lê gunehkar dike ku çawa ji ber tolazekê ku îlave ser wî da anîye, qesta birayê xwe dike? Bata ji ber ku şerekî (îftira) giran û sosret lê hatiye kirin, bi rima destê xwe mêraniya xwe jêdike û davêje avê û ji berçûyina xwinê, ji xwe diçe. Anûbîs gelekî ditirse ku birayê wî ê bimire û rondikan wekî teyrokê dibarîne. Lê êdî ê venegere malê. Anûbîs gelekî ber birayê xwe dikeve û wexta vedigere malê jina xwe dikuje û ji bo dirindeyan laşê wî davêje çolê. Ev çîroka helbet gelekî jî dişibe çîroka Yûsif jî. Jixwe heman erdê peyda bûne.

Di mîtolojîyê de Sîawûş wekî nimûneya  bedewî, pakî û çakîyê ye. Dîsa nimûneya xwedînamûs û dilpakîyê ye. Her çiqasî ketibe tora dêmariya xwe Sûdabe jî  dîsa destê xwe dirêjî bênamûsîyê nekiriye û loma hatiye ceza kirin. Sûdabe gefan Sîawûş dixwe ku jê re bibe yar, “Bala xwe bide min, bibêje, çima meneyan digerî ku rûyê xwe ji  min badî? Ev bejn û bala min, rûçikê min qet naecibînî?...De were carekê agirê dilê min vemirîne, netirse, kes pê nahese. Were ku rojên xamatiya min bibexşîne min û geş bike. Eger gotinên min bikî, ez ê ji padşa zeftir text, tac û kuman te dim. Lê eger te  ya min nekir, ez ê padşatiyê pozê te re bînim û dinya te têkim şevereş.”(Firdewsî;1992;472) Lê Sîawûş mirinê dide ber çavê xwe û Sûdabeyê re dibêje: “ Tu dixwazî ez bavê xwe re mixenetiyê bikim; ji mêrxasiyê, aqlê û exlaqê dûr kevim, ne. Na ev yek nabe… ” û çend şîretan lê dike, ev jî dibe qesasê serê wî.

Li gor salixan biharan dewsa xwîna wî ya pak ku bi neheqî hatiye rêtin,  li rex çeman bi navê “Perî Sîawûş” an jî “Xwinî Sîawûş” kulîlkek dibişkive. Kuştina Sîawûş wekî hatina payîzê û mirin û hişk bûna nebat û giyayan, hêşîn bûna kulîlkan jî wekî hatina demsala biharê û jinûva rabûna Sîawûş ku ew jî di şexsê kurê wî Key Xisro de tê teswîr kirin û bi navê Sîawûş hatina biharê tê pîroz kirin. Ev mît, mirina neheqî û jinûva vejîna di nav mîta Babiliyan ku Tammûz- Dûmûzî, ya Misiriyan Osîrîs û ya Yewnaniyan Adonîs dişibin hevdu. Poşmanîya kuştina wan kesên bêguneh xwe şunda wek di sembola hêşînbûna nebatan de derdibe.

Li gor neqilkirina Nerşahî, bi hezaran salan li Bûharayê,  ji bo şîngirtina Sîawûş, merasîmên taybet yên bi navê “Sîyavûşan” dihatin lidarxistin. Di van merasîman de ji aliyê pîrên zerdeştîyan, bi ‘mûxan’ zêmar dihatin gotin. Ebû Mensûr es-Sealîbî dibêje ku wexta Sîawûş hate ser jê kirin, gelek elametên derasayî qewimîne. Çend merasîmên şînê yên  di dewra îslamîyetê de derketine jî nemaza merasîma 10ê Muherremê, tê bawer kirin ku koka xwe merasîmên Sîawûş girtine.

**Lawkê Rewal û Xwedî Ehl û Eyal: Zembîlfiroş**

Zembîlfiroş jî bi pakî û çakiya xwe dişibe Sîawûş û ew jî wekî wî kurê mîrekiye. “Navê wî Seîd e û bûyera ku bûye mijara destanê di sedsala dehan de, di serdema Merwaniyan de rû dide” ( Samûr;2015, 20). Ev xortê ku dilê mîrbanû, Gulxatûnê  dikevê ne zilamekî ji rêzê ye, merivekî li ser xwe, bedew û cindî bûye. Ev yeka jî mezinbûna wî ya di koşk û serayan de, li ser destan tê. Ew merivekî bawermend û nefspiçûk bûye. Dev ji pismîrtyê berdide,  dest bi zembîlfirotinê dike û  bi malbata xwe emrekî sade diborînin.

Zembîlfiroş merivekî sakar û pak bû. Hinek rewşên bilind di mejiyê xwe de dirustkiribû. Bi qet awayek nedixwast birûxîne û dikaribû li ser şehwetê de serbikeve. Nek ji ber wê ye, xwe hejare û beranberî jina mîrekî belkî ji ber wê ye ku jinekê bi kesekî bêar û nizm û tawanbar dizanî.”( Xaznedar;1998;55)

Çîroka Zembîlfiroş û Gulxatûnê bala gelek helbestvanên kurdan kişandiye û serî de Feqiyê Tayran û pê re Melayê Bateyî û Mûradxanê Bayezîdî wekî helbest ev çîroka evîndariyê ji nû ve honandine. Helbet bi dehan guhartoyên zargotinî jî hene û bi sedan sale li ser zarê gel gihîştiye nifşên nû. Ev çîrok helbet Yûsif û Zuleyxaya kurda ye û jê ne kêmtir e.

Çîroka zembilfiroş wisa ye: Di serdema kevnare de mîrek û kurekî wî hebûne ku kurê wî tayê tenê bûye. Loma ew kur li ser desta bi delalî lê belê hay ji  bûyer û qewimandinên dinyayê,  wekî, şer, nexweşî, mirin û …hwd, bêxeber  hatiye mezinkirin.  Ev kurê mîr bi bejn û bala xwe, bi xeyset û edeba xwe, bi xweşikbûna xwe hema bêje bê qusûr bûye. Mezin dibe û dibe xortekî çeleng û  mêrxas.

Kurê mîr  gelek caran bi wezîrê bavê xwe re derdiket raw û neçîrê. Rojekî dîsa ew û wezîr li neçîrê vedigerin û wexta ku ber gorîstanê re derbas dibin,  di gorîstanê de tiştek bala kurê  mîr dikişîne. Li ser gorekî qafikê serê însanekî dibîne. Bi meraq qafikê serî dinhêre. Li gor çend guhartoyên din jî rastî merasîmekê tê ku cinyaze ser milan dihat birin ji bo axkirinê. Ji ber ku pismîr e û di koşk û serayan de mezin bûye  rastî tiştekî wisa nehatiye. Heta wê rojê derheqê mirin û piştî mirinê tiştek nizanbûye, kesî jî jê re qala mirinê nekiriye.

Kurê mîr  wezîrê xwe dipirse ev çi tişt e? Wezîr jî jê re behsa mirinê dike ku  mirin guh nade filankes dewlemend e, mîr e,  feqîr e, ciwan e, kal e,  kes tune ku ji destê mirinê bifilite. Zû an dereng her kes rojekê dikeve tora wê.

Piştî van agahiyan kurê mîr dikeve nav ramanên kûr û dûr. Êdî dizane ku ew ê jî rojekê bimire. Hestekî rûhanî lê peyda dibe û dixwaze dev ji her tiştê dinyaya derewîn berde loma dawa terikandina qesr û qonaxên bavê xwe dike û bi jina xwe  dest bi jîyaneke nû dikin. Ev kurê mîr  êdî bi  çêkirin û firotina zembîlan mala xwe birê dibe. Êdî navê wî wekî Zembîlfiroş tê zanîn. Bi vî cureyî sal derbas dibin, zarokên wan tên dinê û barê zembîlfiroş girantir dibe. Paşê tên li Farqînê bicî dibin û Zembilfiroş ku li gor salixan navê wî “Seîd” e  her roj kolan û kûçeyên Farqînê digere ku zembîlên xwe bifroşe û pê nanekî zarokên xwe re bibe. Halê wî ne tu hal be jî, lê rizqê xwe yê ji destê xwe razî dibû.

Zembîlfiroş lawkê rewal bû,
Bi kulfet û ehl û eyal bû,
Husnekî Ûsif li bal bû,
Heq rizaqê qismetê.

Rojek ji rojan dîsa kolan bi kolan digere  ji bo firotina zembîlan. Ji nişke ve jina mîrê Farqînê, Gulxatûn ji şibaka koşkê, wî dibîne û hiş û aqil serê wê diçe. Nêta xwe xirab dike ku Zembîlfiroş bîne koşkê û evina agirê dilê xwe pê eyan ke. Bi hênceta zembîl û selikan Zembîlfroş gazî serayê dike û bi helbestî daxwazîyên dilê xwe ji re rêz dike.

Zembîlfiroş zembîla tîne
Kolan kolan digerîne,
Xatûnê li hewalê dibîne,
Hiş diçe aqil namîne.

Muhbetê keç mubtela kir
Sur li carîyan aşkera kir
Lawikî qelbim cuda kir
Min ji eşqa xew ne tê

Gulxatûn xwe ranagire, cariye û xulaman dişîne pey Zembîlfiroş û wî tîne qesrê. Derdê Gulxatûnê ne bazarkirina zembîlan e, vemirandina agir û evîna nava dilan e. Lê naxwaze Zembilfiroş nêta dilê wê bihese loma bi nêta bazara zembîlan wî  dixwaze koşka mîr.

Zembîlfiroş lawkê dewrêş e,
Kerem ke tu were pêş e,
Qîmeta selka tu bêje,
Ez ji hizna te bûm kerr û gêj e.

Zembîlfiroş lawkê biyanî,
Kerem ke tu were banî,
Qîmeta selka tu zanî,
Xelk xam e, tiştek nizanî.

Xatûn dibê lawê beyanî
Lew dibem tu bizanî
Min tu ji bo dilê xwe anî
Da em bikin misilhetê

Bi van gotinan Gulxatûn nêta dilê xwe zembîlfiroş eşkere dike û dixweze wî bikşîne nav sîng û berê xwe. Lê Zembîlfiroş ji ber pakî û jiyana xwe ya rûhanî naxwaze bikeve tora Gulxatûnê. Xatûnê lava dike ku dev jê berde. Bixwe xwedî erz û eyal e. Tek derdê wî ebûra mala wî zarok û zeçê wî ye û ev

tiştê ku xatûn dixwaze “ne tiştekî rêzê ye û li ber rebê jorîn jî nerewa ye” loma Zembîlfiroş rû nade xatûnê. Xatûn pesnê bedewbûna xwe, pesnê mal û milkê mîr dide ku hazir e hemû pêşkêşî nefsa canê wî bike tek bila dilê wê xweş bike. Lê dike û nake Zembîlfiroş rê dernayê. Ev yeka agir û şewata Xatûnê û pê re rik û kîna wê jî gurtir dike û Zembîlfiroş di qesrê de dike zîndanê. Her rojek ji bo xatûnê dibe mirinek ku Zembîlfiroş nedihat ser gotina wê û berdana xwe jê dixwast.

Zembîlfroş, tobedar e, xweyê jin û zarok e, sond xwarîye ku rêya xerabîyê ve neçe. Tobe û soza xwe xerab nake û weha cewaba Xatûnê dide:

Xatûnê ez tobedar im
Delalê ez tobedar im
Zarok birçîne li mal in
Ji Rebbê jorî nikarim

Xatûna bi gerden morî,
Şixul nabin bi kotek û zorî
Tirsa min ji rebê jorî,
Xatûnê wez tobedar im.

Dema ku cariye û Gulxatûn hewl didin ku wî bixapînin, Zembîlfiroş navê mîr dide ser lêvên xwe û dibêje tu para mîr î, nabe ez dest dirêjî te bikim.

Law dibê ya bîsk herîr e,
Ew di pîroz bin li mîr e,
Çi heddê lawê feqîr e,
Dest bete vê subhetê.

Zembîlfiroş her çiqasî ji Gulxatûnê lawa bike ku dest ji vê suhbetê berde jî , êdî dizane ku ji destê Xatûnê filitîn ne pêkan e, lê ew merivekî xwedînamûs û pakiyê ye, ji xwe re bo revê çareyekê difikire. Ji bo destavê û dest û rû şûştine destûrê dixwaze. Xatûn ji ber tirsa reva wî bendekî bi lingê wî ve girê dide û dişinê destavê ya birca herî jor. Çend xulaman jî pê re dişîne. Zembîlfiroş neçar dimîne xwe birca herî bilind re berdide jêr.[3] Ev birca ku Zembîlfiroş xwe jê berdide, bircekî gelek bilind bûye, lê belê, tu xesar negihiştiye Zembîlfiroş û sax û silamet rabûye ser pîyan û vegeriyaye mala xwe. Dilpaqijî, helalî û namûs, çawa em dibnin kakilê felsefeya jiyîna Zembîlfiroş pêk tînin( Samûr, 2015; 132) Motiva sereke ya Zembîlfiroş xwedûrxistina ji gunehan û mukafata Xwedê ku axireteke baş e. Çawa ku Yûsif xwe ji xweziyên Zuleyxayê radigire, xwe teslîmî Xwedê dike, bi heman awayî Zembîlfiroş jî vê yekê dike û li gor riwayetan Xwedê ji ber dilpakîya wî Cebraîl tê alkariya wî û bê zirar û ziyan dadixe ser erdê nerm wî ji zehmet xilas dike.

Xatûn pê dihese ku Zembîlfiroş revîyaye, diqehire û bi şewata dilê xwe, dadikeve kolan û kuçeyan, dikeve pey rêça Zembîlfiroş ku bizani be ka mala wî li ku derê ye. Wexte ku Zembîlfiroş ne li mal e, Xatûn diçe cem jina wî û bi lawayî, bi zêr û zîv û xişiran wê razî dike ku wê şevê dewsa wê, ew têkeve nava nivînên Zembîlfiroş.

Wê şevê cilên jina Zembîlfiroş li xwe dike û dikeve nava nivînan û benda Zembîlfiroş disekine. Zembîlfiroş derengê şevê vedigere mal û dikeve nava nivînan. Xatûn xwe Zembîlfiroş dialîne û dema ku lingê Zembîlfiroş xirxalên zivîn dikeve pê dihese ku ev ne jina wî ye. Bala xwe dide ku xatûn e, tavilê cihê xwe dipeke, mal derdikeve, berê xwe dide çiya û baniyan û xatûn jî pey wî çola dikeve.

Zembîlfiroş bala xwe didê ji destê xatûnê xilasbûn ne mimkûn e, ji Xwedê lavayî dike ku hema ali wê derê ruhê wî bitsîne ku vê ezabê xilas be. Xwedê daxwaza wî tîne cih û Zembîlfiroş canê xwe ne teslîmî Xatûnê teslîmê axa sar dike. Dema ku xatûn digihîje ser Zembîlfiroş êdî dereng e û nikaribûye

[3] Ev birca bi navê xwe Zembîlfiroş girtiye, wekî Birca Zemblfirok tê binav kirin.

bigihîje mirazê xwe. Li xwe dixe, ax û fixan dike û ji kerba evîna xwe ew jî ruhê xwe teslîmî axa sar dike.

Li gor guhartoyeke Zembîlfiroş ku di Folklora Kurmanca de tomar kiriye ne li gorî rêzê ye. Vê carê Zembîlfiroş ji ber Benî xatûnê xwe ranagire û hev şadibin. Ji ber ku Zembîlfiroş ya Benî xatûnê kiriye û rê derketiye stara xwedê jî derbûye û wekî guhartoyên din di mala wî de rizq nebariye û dawîyê mîr jî kirina herduyan dihese û wan dişîne zîndanê.Yûsif jî ji ber xiyaneta jina ezîzê Misirê dikeve zîndanê.

**Zilamê Bedewtirîn yê Rûyê Dinyayê: Yûsif**

Hz Yûsif, li gor lêkolînerên li ser Kitêba Pîroz dixebitin, BZ. Ni navbera salên 1695-1585an de jiyaye (Türkdoğan, 2011;1). Lê "li gorî lêkolîn û vedîtinên arkeolojîk Hz. Yûsif beriya Îsa, ango berî zayînê, di derdora 1400î de li Misirê, di nav burokrasiya bilind a Fîrewnan de, cî girtiye" (Samur, 2015:184). Cihê ku Hz. Yûsif rabûye (Kenan-Filstîn) erdê di navbera şaristaniya Misir û Mezopotamyayê de ye. Ev der ji ber ku di ser riya bazirganiyê bû ku gelek karwan lê diborin gelek caran hatiye dagir kirin. Li wê demê hukimdarên Misirê re Fîrawûn dihat gotin. Li gor Quranê û Tewratê Hz. Yûsif bandoreke yek xwedayî li ser firawûn kiriye lê ev yeka ne pêkan e ku li wê wexte sistema olî ya Misirê pagan bû û Firavûn hem serekê xwedayî hem jî serekê dinyewî bû. Firawûn çawa dijî sistema baweriyê ya Mûsa rabûbû helbet divê li hember Yûsif jî rabûya. Disa jî meylek derketiye holê ku ew kesê ku rêveberê Misrê ye û behs tê kirin ne fîrawûn e, Melîk e û payeyekî herêmî ye. Desthilatdariya Hiksosan ( hekau-khasut) ku li Asyayê daketibûn başûrê Misirê û ew welat dagir kiribûn heman demê ye ku Yûsif jî tê jiyaye.

Di encama lêkolînên arkeolojîk de, li bajarê Tel-Amarrayê, tirbeya kesekî bi navê Tûtû hatiye dîtin. Li gorî belgeyên ku di vê gorê de hatine dîtin, Tûtû serkêşê Xizmetkarê qral, alîkarê karên teahûdê, berpirsyarê gencîneyê bûye. Her wiha hatiye ragihandin ku ji nijada Samîyan e. Ev agahî rasterast ji karên ku Hz. Yûsif kiriye dinêrin. Cudahiya navên Yûsif û Tûtû jî mumkin e ji ber zimanê Misirê û guherîna nav pêk hatibe. Li Misira wê rojê, navê Yûsif divê ku Tûtû be.(Samur, 2015; 185. Vdg. Ji Ekrem Sarıkçı, Dinler Tarihi, r.32) Bi îhtîmalele mezin e Zuleyxa ku bi evîna Yûsif dikeve, jina Akhenetan be ku di wê serdemê ezîzê Misirê ye.

Çîroka Yûsif û Zuleyxayê (Zelîxa, Zelxê) jî gelekî berbelav e û hem pirtûkên pîroz, di Quran, Încîl û Tewratê de, hem formekî zargotinî hatiye gotin û hem jî formeke edebî hatiye honandin. Ev çîrok helbet di nav zargotina kurda de jî cihekî mihkem girtiye û bi sedan salan hatiye gotin. Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl, şaxeke destana Yûsif bi navê "Aqûp Pêxember" berhevkirine û Zargotina Kurda de çapkirine. Xên ji vî di nav gel de gelek çîrokên devkî jî têne gotin. Li gor navkirina kurda navê Yûsif, Ûsiv e û navê Zuleyxayê jî Zelîxa an jî Zelxê ye. Di vî mijarê de çavkaniya sereke Tewrate û çîrok wisa ye; "Ûsiv bejin û balêda yekî berbiç'ev û bedew bû. Pey van yekara usa bû ku jina axayê wî ç'e'v berda Ûsiv û gotê: "Serê xwe minra dayne". Lê ewî t'exsîr kir û gote jina axayê xwe : "Axayê min haş ji pê t'une mala wîda çî wî cem min heye û h'emû hebûka xwe daye destê min. Vê malêda jî ji min mezintir kes t'une û tiştek jî ewî ji minra na-na nekirîye pêştirî te, çimkî tu jina wî yî, ezê çawa vê xirabîya mezin bikim û li ber Xwedê gune bikim?"(Pênc Kitêbêd Mûsa;2010, 87).

Çîroka Yûsif û Zelxêyê ya kurdî wisa ye; Ûsiv kurê Aqûp pêxember e û dozdeh xwişk û bira ne. Ûsiv û Binyamîn ji jina wî Rahilê ne. Çîrok li Kenanê dest pê dike û Misirê diqede. Ji ber ku Ûsif zarokekî pak û zana bû, ber dilê Aqûp ezîztir û şîrîntir bû loma zirbirayên wî çavreşî û hesûdiya wî dikirin. Rojekê Ûsiv xewnekê dibîne û bavê xwe re behsa xewna xwe dike. Bavê wî temî lê dike ku birayên xwe re behsa wê xewnê neke çimkî ditirse ku birayên wî tiştekî nebûyî bînin serê wî. Lê belê xwişka wî wan gotinan dibihîze û birayên xwe re behsa vê yekê dike. Birayên wî ditirsin ku Ûsiv rojekê bê û dê bibe serwerê wan loma dixwazin wî ji malê dûrbixin, bila winda be.

Bira diçin neçîrê, dixwazin Ûsiv jî bi xwe re bibin Aqûp pêxember destûra wî dide. Zirbirayên wî li ser rê rastî bîrekê tên û çepilê Ûsiv digirin wî davêjin bîrê. Zirbira vedigerin malê û dibêjin ku guran Ûsiv xwar. Aqûp pêxember guran hev dicivîne wan dipirse, çima we Ûsivê min gestiye? Gur tên

zimên, sond dixwin; “devê meyî bestî be, didanê meyî şkestî be, herkê me Ûsivê nazik gestî be. Me Ûsiv nexariye.” ( Celîl&Celîl;1978, 198)

Wextekê karwanek li rex bîra ku Ûsiv tê de ye derbas dibe, bo av kişandinê disekinin di bîrê de Ûsiv derdixin û bazirganbaşî Ûsiv di bazara Misirê de difroşe. Li Mirsê jina melîkê Misrê Zelxê, berê zewaca xwe, di xewna xwe de Ûsiv li Misrê dîtibû û bengî bûbû. Zanibû ku qismetê wê li Misrê ye. Jineke têra xwe bedew bû. Wexta ku Melîkê Misrê hatibû xwazginî wêtirê Ûsiv e, loma qebûl kiribû. Lê belê paşê pê hesiyabû merivekî kal û extyar e. Nexwast pê re here lê melîk, ku berhevoka kurdî de Eşqer-pêxember tê gotin, nexwast rûmeta wî erdê keve, Zelxe girt bir. Wexta ku Ûsiv di bazarê de difirotin her kes bejn bala wî, bedewbûna wî hijmekar mabû. Helbet ev xebera gihişt Zelxê jî ku merivekî pir bedew li bazarê tê firotin. Niqutî dilê Zelxê ku ew kes Ûsiv be. Zelxê diçe bazar heft bar xişrê xwe dide lê têra beranberî Ûsiv nake û Ûsiv dibêje; Zelxe bende çi têr dibe? “ Dibêje “kulmek xalî” Kulmek xalî avît ser Ûsiv, Ûsiv rabû pê re çû. Ûsiv dibe bendeyê Zelxê. Zelxe dixwaze dilê xwe pê şa bike lê belê Ûsiv xwedî namûs û îffetê bû ev yeka qebûl nekir. Rojekê dîsa Ûsiv dibe oda xwe lê Ûsiv ya wê nake û Zelxe li ber kerba, para kirasê wî diçirîne. Zelxê ji ber kirina xwe ditirse û diçe gilîyê Ûsib li melîk dike;

“Ew zarekî bêhudeye,
Çev li doşeka teye,
Stîyê wî biqetîne namilêye**.”**

Melîk xwesteka Zelxê nekirya, jixwe zanibû Zelxê îlava Yûsif dike. Girt ew kire zîndanê. Ûsiv di zîndanê de xewnê du kesan şîrove dike û şîroveyên wî rast derdikevin. Ji wan her du girtiyan yek tê kuştin yek jî tê berdan. Piştî gelek wextan paşayê Misrê xewnekê dibîne ku heft çêlekên(ga) jar, heft çêlekên kok xwarine. Kes rastiya xewna wî nikare derxe. Ew mehkûmê ku xewna xwe Ûsiv dabû şirovekirinê diçe bal melîk û behsa Ûsiv dike. Xulese Ûsiv zîndanê derdixin û li gor xewnê Ûsiv tedbîran jî dibêje ku ê heft sala bereket be heft sala jî xelayî be. Divê tedbîr bên girtin. Melîk, Ûsiv dike serkarê bajêr û hemû berpirsiyariyar dide destê wî. Zelxe û mêrê wî dikevin haleke xirab. Lê Zelxe dîsa jî dev ji Ûsiv bernade. Li gor çend guhartoyan Cebraîl wehîy anîye ku Ûsiv Zelxê re dikare bizewice. Lê, ji ber ku Zelxe êdî pîr bûye û herdu çavan kor bûye, ne xweşik e, Ûsiv, ev yeka nepejirandiye. Gava Ûsiv ji Xwedê dia dike û Cebraîl baskê xwe rûyê Zelxê dide û Zelxe vedigere ciwanî û xweşikbûna xwe ya berê û digihîje mirazê xwe yê çendik çend sala. Lê belê felek dîsa çerxê xwe çep digerinê piştî çend salan Ûsiv dimire.

Çîroka Yûsif û Zulêyxayê bi navê “ehsenu’l-qeses” ango çîroka herî xweş ya dinyayê hatiye bi nav kirin û di Quranê de Zuleyxa ku navê wê nayê gotin zêdetir nayê lome kirin. Di Quranê de behsa bûyerê di sureya Yûsif de tê kirin. Sureya Yûsif 111 ayet in û li Mekkeyê daketiye. Di ayeta 23an de behsa jina Ezîz tê kirin; Kevaniya malê, ( li ser wî bengî bû û) xwest ku dilê xwe pê şa bike û deri li ser zirze kir û got “de were.” Wî jî got, “rebbê xwe ditirsim, (mêrê te) xwediyê min e, ji min re qencî kirin. Bêguman yên zulmkar xilas nabin” Di ayeta 24an de tê gotin ku Xwedê dilê Yûsif hizra xirabî û destdirêjîyê şûştibû loma xwesteka jinikê nekir. Jinikê da dû Yûsif lê zeft nekir û mîntanê wî li ser pişta wî re çirand. Tavilê mêrê kebaniyê li ber derê odê ew dîtin û jinikê got ku “ yê ku dixwazin xirabiyê bînin ser mala te helbet cihê wî zîndan e û cirmê wî jî ezebekê giran e.” Yûsif nêta jinikê ji Ezîz re got û bi tewrê çirîna kiras tê fehm kirin ku Yûsif bê guneh e. Kirina jina ezîz di nav jinên bajêr de belav dibe û dest bi xeyban dikin. Jina Ezîz wan dawetî mal dike, li ser siniyan sêvek û kêrekî dide destê wan û Yûsif derdixe ber wan. Wexta ku Yûsif dibînin tilî pêçiyên xwe jê dikin. Ayet 32; Li ser vê yekê jinikê ji wan re got ku; “ev, ew kese ku hûn bona wî lome li min dikin. Sond dixwim ku min xwest wî re şa bibim. Lê belê, ew ji ber ku merivekî xwedî îffetê bû ev yek nekir. Sond dixwim, eger ya min neke ew ê helbet ê tekeve zîndanê û ezabên giran bibîne.” Û Yûsif Xwedê lawa kir ku zîndanî bûn çêtir e ku destdirêjiya ku wan jinan dixwastin. Û her çiqasî Yûsif bêgunehiya xwe ispat kiribe jî dîsa jî hatiye zîndanî kirin. Xwedîîffetî bûnê fazîleta herî payebilind hatiye hesibandin û ev yeka di kesayetiya Yûsif de hatiye honandin.

Di Tewratê de tê behs kirin ku Yûsif delaliya bavê xwe bûye. Ev yeka wî dike kesekî pozbilind û qure loma birayên wî jê heznekirine û çavreşi lê kirine. Çavderiya birayên xwe dikir û kirinên wan ji bavê

xwe re wekî gilî digot. Roja ku diavêjin bîrê jî dîsa ji bo çavderîyê bavê wî, ew şandibû pey birayan. Jiyana wî berê daketina bîrê û derketina bîrê dibe du beş û piştî bîrê û çûyina Misire dibe merivekî nefspiçûk, behnfireh, jêhatî, zana û xwedîîffet. Di Quranê de Yûsif merivekî nefsbiçûk, dilpak û dilrehm e. Berevajî Tewratê li ber birayan pozbilindiyê nake. Loma kiryara ku lê hatiye kirin, cirmekî giran û wekî neletekî birayan re anîye.

Navê Yûsif cara pêşîn di Tewrat de derbas dibe û bi Îbranî Josef e. Meneya hîvê dide. Hîv çawa sembola bedewî û cindîtiyê xwe di şexsê Yûsif de derbirîye. Di qonaxa ewilin de li Rojhilata Navîn nemaze li Mezopotamyaya jorîn hîv wek xwedavendekê dihat pîroz kirin û her kesî peresteyî wê dikir. Çawa Yûsif ji xewna xwe de 11 stêr, roj û hîvê dibîne ku hemû jê re secde dikirin. Di vir de nîşaneya paganîzmê hêj holê ranebûye û dibe ku perestiya hîvê hêj zal be. Li gor dîroknasê Misirî Ahmed Osman, Yûsif bapîrê Akhenaten e ku bixwe şexsiyeteke mîtolojîk û dîroki ye. Dibe ku Akhenaten di avakirina sistema xwe de, di bin bandora bapîrê xwe de mabe. Akhenaten beriya Mûsa rabûye û baweriyek li Misirê belavkiriye bi navê Aten. Tê gotin ku ev baweri paşê bi destê Mûsa hatiye revîze kirin û bûye dînê yekxwedayî.

**Pirsgirêka Sîawûş, Zembîlfiroş û Yûsif**

Bedewî di şexsê Yûsif de bûye nasnavekî û wexta ku bedewiya kesî nîşan didin û pesnê wî didin wî dişibînin Yûsif. Zembîlfiroş jî ne di rêza Yûsif de be jî di bedewî û çelengîyê de nêzî wî ye loma di destana Zembîlfiroş de wexta ku behsa wî tê kirin tê gotin ku “Zembîlfiroş lawkê rewal bû, bi kulfet û ehl û eyal bû, husnekî Ûsif li bal bû.” Di sembolîzma tesewifê de jî nîşana bedewiya ruhanî û nefsanî ye û wêjeya klasîk de jî kesê “kamîl û rûbedew (kemal û cemal)” hatiye destnîşan kirin. Dîsa Yûsif zilamê bedewtirîn yên rûyê dinyayê hatiye pejirandin ku şibandine roj û hîv ê. Serî heta piyan nûr e û bêrikber e. Bejna wî tak rihan e, rûyê wî wekî neynikekê zelal û pak e, gotinên wî dermanê dilan in. Porê wî wek sunbulê, birûyên wî wek mihrabê, çavên wî wek nergîzê, devê wî wek goncayê ye û diranên wî jî şibandine durran. Lêvşekir e û lêvên wî ava heyatê ne û kê jê tehm bike nemiriyê dest dixe. Li gor hizra tesewifê ew neynikeke xas û pak e ku bedewiya îlahî xwe dilqê wî de nîşan daye. Di warê bedewîyê de Sîawûş jî van kesan ne kêmtir bû û ew jî wekî nîşana bedewî û cindîtiyê hatiye bikar anîn. Di berhevoka Heciyê Cindî de tê gotin ku “Birakî Gêvêê Goderz heye, navê wî Sîawûş bû. Di dinyaê da meriv ne bixwe, ne vexwe, temaşa husil û cemalê wî bike” (H. Cındî;1977,298).

Em dikarin bibêjin ku sedema bobelatên hatine serê Yûsif, Zembîlfiroş û Sîawûş hema bedewî û çelengiya wan e. Bedewî çawa bûye cirm ketiye stûyê jina wisa jî wekî cirm ketiye stuyê mêran jî. Bedewîya mêran berevajî îro di dewrên qedîm de zêde hatiye bikaranîn û bi gelek cureyan wekî peyker, mîtos û efsane hatiye honandin. Di peykerên ku hatine dirûst kirin de laşê zilaman bêkêmasî hatine teswîr kirin. Dîsa em dizanin ku di çerxa ewilîn de ne tenê jin, zilamên bedew û çeleng jî di bazaran de wekî bende dihatin firotan û bikirên wan jî jinên dewlemend û xwedî desthilatbûn. Ev zilam gelek caran dibûn şevbuheriyên wan jinên xwedîhêz (Çawa Gulxatûn ji Zembîlfiroş re dibêje “tu hem şayî, hem şevbihêr, ev e ji te ra bazar û xêr”.) Di çerxa ewilîn de hema bêje hemû şaristaniyan de ev yeka derdikeve berpêş. Di wê çerxê de tiştekî asayî bû ku jin pey mêran bikevin. Mêr çawa sembola hêzê her wisa sembola bedewiyê jî bûne. Em belgeyên dîrokî û pirtûkên pîroz dizanin ku Yûsif û Sîawûş di çerxa ewilîn de jiyane lê belê tarîxa rûdana bûyera Zembîlfiroş ji ber ku wekî çîroka Yûsif û Sîawûş ku di wextê de nehatiye nivîsîn teqez nay zanîn gelo kîjan wextê rûdaye. Lê dîsa jî em dikarin bibêjin ku ne zêde dûri van herdu şexsiyeta ye.

Ev her sê kes merivên dilpak in, xas in û zana, camêr û merivên xwebexş in ku heta navê wan derbikeve, xwestine canê wan derkeve. Destdirêjiya heramiyê nekirine. Serê pêşin di rewşa Yûsif û yên din de jî li ser nefspiçûkiyê ku destdirêjiya jinan nekirine ewqas jî tirsa Xwedê li cem wan peyda bûye û ev yeka anîne zimên jî. Her sê jin jî van zilaman di odeya xwe de ase dikin û helbet hêza xwe ya desthilatiyê jî bikar tînin. Çimkî ev kesan, bende û berdestiyê wan in. Gulxatûn dibêje “lawkê nenas, tena derpê û kiras, tu ji destê min nabî xilas.” Zuleyxa jî Yûsif di odeya xwe de bihnteng dike û nahêle dest wî bifilite loma destê xwe davêje lê kirasê wî dest dikeve. Dîsa jina Key Kavus Sûdabe jî bi fêlan Sîawûş dikişîne odê û ew jî wekî Gulxatûnê hêza xwe bikar tîne û gefa lê dixwe;

“Go: Bi ezet, celaletê Xwedê kim,

Tu vî şuxulî gel min nekî,

Ez ê serê te bidime birrîn." û axir Sîawûş ji dest difilite. Çawa xwesteka dilê jinan nekirine Sîawûş ji ber xezeba Sûdabeyê koşk û serayê dûrketiye, Zembîlfiroş û Yûsif jî ber xezeba jinan bûne bendeyê zîndanan.

Sûdabe, Gulxatûn û Zuleyxa jî bedewtirîn û xweşiktirîn jinên dewra xwe ne. Firdewsî di Şahnameyê de behsa Sûdabeyê dike û dibêje ku rûyê wê wekî hîvê ye, porê wê xingalî ye û wekî hûriyan bedew û wekî sterka diçûrise. Wexta Sûdabe cara ewilîn rûyê Sîawûş dibîne dilê wî dipirpite û hiş û aqil namîne, ji ber huba wî xwarin û vexwarinê bîr dike û wek tayekî an jî wek qeşaya ber tevê roj bi roj di halê xwe de dihele. Bedewîya Sîawûş ser ya xwe re dibîne.Yûsif çawa hîv bê hesibîn, "Zuleyxa jî 'mîsalê mahê', 'zîba', 'durdane', 'horîsifet û melekmisal' û 'şems' e"(Geverî; 2013,136). Gulxatûn jî wekî navê xwe nazenîn û xweşiktirîn jina dewra xwe bûye ku jina herî payebilindê Farqîne bûye. Jixwe Zembîlfiroş bedewiya wê dipesîne û û dibêje ku "Xatûnê gerden şibak, gerden tenik, şirîn î wek şerbeta camî. Di çend guhartoyan de jî wekî "husnî nûrîn", delal, terr û can, bejn û bala bê qusûr, dêmşemal, şeng û şepal, gerden bi xal, gerden hîv, sîngên wek fîncana şîr û şekir. Zembîlfiroş xwe layiqê wê nabîne û dibêje; "ya bîsk herîr e, ew di pîroz bin li mîr e."

Ev her sê jinên ku çavberdane her sê zilaman, bajarî ne û jinên mîr, melîk û şah in. Prof. Dr. Marûf Xaznedar destnîşan dike ku "mîr û dewlemend û merivên mezin çavên wan li derva ne, peywendiyên di gel jinên din de peyda dikin yan jî her yekekî çend jinên wan yên aşkere yan jî nihînî hene. Ji ber vê jî jinên van mirovên mezin ewil didin nav valahîya nav derûnî, xwe tijî dikin û tolê ji mêrên xwe bistînin. Eva tiştekî sanahiye, eger peywendî di gel herkesekî de peyda bikin ku dilê wan be."(Xeznedar, 1998;51)

## Encam

Sîawûş, Zembîlfiroş û Yûsif sê peyayên çeleng, keleş û bedewtirînên dewra xwe bûn. Beranberî wan jî Sûdabe, Gulxatûn û Zuleyxa sê xanimên bedew, kaw û kubar û nazenîn bûne. Lê berevajî sewdaseriyên jirêzê, ango sewdaseriya mêran ji bo jinan vê carê yên li ber agirê evînê har û dîn dibin jin in. Ev evîneke ewqas xurt bûye ku berevajî edet û toreyan ev her sê jin nefsa xwe nikaribûne û bi cureteke mezin destdirêjî van her sê mêran kirine û bi negihîştina armanca xwe jî bûne sebebê kuştin, zîndanîkirina wan. Ev "çîrokên dinyayê yên herî xweş" helbet cihê xwe di nav zargotin û wêjeya Kurdî de jî girtiye. Ev çîrok bûne destan, stran û roman wêjeya kurdî xemilandine û dixemilînin.

## Çavkanî


Alan, R. (1997) Buda, Yûsif û Zemblfiroş, War, Hejmar 3. Stenbol.

Celîl, O. – Celîl, C. (1978) Zargotina Kurda I, Neşîrxana Naûka, Moskva

Celîl, O. – Celîl, C. (1994) Destanên Kurdî, Weşanên Zêl, Stenbol

Cindî, H. (1979) Şaxêd Eposa "Rostemê Zale" Kurdî, Akademiya Ulma yê YSS li Ermenistanê, Erêvan,

Ebû Cafer Muhammed bîn Cerîr bînYezîd el-Taberî, (1991) Milletler ve Hükümdarlar Tarîhî II Weşanên MEB, Stenbol

Firdevsî ; (1994) Şehname C.I, MEB Yayınları, İstanbul,

Firdevsî ; (1992) Şehname C.II, MEB Yayınları, İstanbul,

Firdewsî ; (1994) Şehname C. III, MEB Yayınları, İstanbul ,

Geverî, A. (2015) Yusif û Zuleyxa-Selimiyê Hîzanî, Nûbihar

Kuran-ı Kerim ve Türkçe Mealî. TDV. Ankara,

Örs, D. Siyavuş, (Di nav Îslam Ansiklopedisiyê de ), TDV, Ankara

Pênc Kitêbêd Mûsa (Tawret) ;(2010) Înstîtûta Wergerandina Kitêba Pîroz, Moskva

Resul, Prof. Dr. İ. M. (1998) Jiyan û berhemên Feqiyê Teyran (Werger, Mikaîl Canpolat) War hejmar 3, Zivistan1998, Stenbol

Samûr, A. (2015) Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê, Nûbihar

Türkdoğan, M. Gökcan , (2011) Klasik Türk EdebiyatındaYusuf ve Züleyha Mesnevileri Üzerine Mukayeseli Bir Çalışma, Weşanên Wezareta Çandê, Ankara

Xeznedar, Prof. Dr. M. (1998); Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran (Werger, Mikaîl Canpolat) War, Hejmar 4, Bihar1998, Stenbol